**Haci Akman** xelkê Bakurê Kurdistanê ye û welatiyê Norwêcê ye. Ew Profesorê Lêkolînên Çandî ye li Zanîngeha Bergen, beşên Arkeolojî, Dîrok, Lêkolînên Çandî û Ol. Wî bi zimanên norwêcî û îngilîzî gelek berhem belav kirine. Lêkolînên wî li ser koçberî, etnîsîte, dîaspora û mîrata çandî disekinin.

**Veman Lineva** xelkê Duhokê ye û welatiyê Norwêcê ye. Wê bawernameya bekelorya di warê çand û zanist de û bawernameya masterê jî di warê zanist û ol de li zanîngeha Bergen wergirtine. Dema ku li zanîngeha Bergenê dixwend, seroka Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê bû. Lineva çalakvana sivîl û bandoerkera torên civakî ye.

**Sîrwan Kawsî** ji Rojhelatê Kurdistanê ye. Nivîskar û çalakvanekî siyasî ye. Çend pirtûk bi kurdî çap kirine, weke: Hokarekanî Bedewletnebûnî Kurd û Mêjûy Deselatdari Ayînî le Êran. Kawsî di Kongreya nîştimanî ya Kurdistanê de kesayetek çalak bû, 12 salan berdevkê kongrê bû û sê salan jí di radyoya wê de xebat kiriye. Lêkolînên wî di warê Dîrok de ne. Peywendiyeke nizîk di navbera wî û Jemal Nebez de hebûye û di tayip kirina şeş pirtûkan de bi Nebez re hevkar bûye.

**Faxriya Adsay** ji Bakurê Kurdistanê ye û li Amedê (Diyarbekir) dijî. Li Zanîngeha Teknîkî ya Rojhilata Navîn li Enqereyê bekelorya dîrokê qedandiye. Bawername ya xwe ya masterê li Zanîngeha Dîcleyê ya Amedê di beşa civaknasiyê de û li Zanîngeha Mêrdînê jî di beşa Ziman û Wêjeya Kurdî de bi dest xistiye. Nivîskar û edîtorê Kovara Zarema ye (kovara rexne û teorî, di navbera salên 2014-2022 de 16 hejmar derketine). Wê çend pirtûk û gotar ji Îngilîzî wergerandine Tirkî û Kurdî. Wergera wê ya dawîn a bi kurdî otobiyografiya Golda Meir e. Niha jî otobiyografiya Mahatma Gandî werdigerîne kurdî. Biwarê wê ya sereke ya lêkolînê neteweperestiya kurdî ye.

**Bêkeş Takouk** welatiyê Almanyayê ye û xelkê Kurdistanê ye. Li Zanîngeha Goethe ya Frankfurtê di warê civaknasiyê de bawernameya masterê wergirtiye. Çend salan wek rêvebirê projeya perwerdeya siyasî li kurdische Gemeinde Deutschlamd e.V (Civaka Kurd li Almanya) kar kiriye. Di pirojeya perwerdeya siyasî de bi awayekî aktîf beşdarî gelek semîner û civînên girêdayî Kurdistanê bûye û li ser vê mijarê gotar nivîsandine. Herwisa ji bilî beşdarbûnê, wê bi xwe çend semîner organîze û moderatorî kirine. Bêkeş di van deh salên borî de jî bi xwebexşî beşdarî proje û çalakiyên kurdan li Almanyayê bûye.

**Xunav Haco** ji Rojavayê Kurdistanê ye û li Almanya dijî. Ew çalakvan û nivîskar e. Endama Encûmena Niştimanî ya Kurdî li NRW bûye. Di heman demê de rêvebira komeleya Ronahî ye li bajarê Bochum. Ew perwerdekara civakî ye û di vê biwarê de xwedî bawername ye. Herwisa (1996-2000) li zanîngeha Bochum di biwarê lêkolîna jinan de (Jin di çand û siyaset de) ders xwendiye. Ji 1990 heta 1995 li beşa Kurdî ya WDR li Dortmundê xebitiye. Di sala 1992 Koma navneteweyî ya Xebata Jinan ji bo alîkariya jinên Kurd ava kiriye. Endama Platforma Jinên Kurd e ji sala 1994 heta îro. Endama Dêra Jinan a Bochumê (2006 - 2013) bûye. Damezrîner û birêvebera fêrgeha Ziman a WIS li Bochum bûye. Herwisa damezrînera komeleya Rewşen Bedirxan (yeketiye jinên Kurd-Alman) e

**Sîrwan Rênas** lêkolînerekî serbixwe yê Kurdistanî ye. Gotarên wî yên bi zimanê kurdî, weke: Qeyranî Nasinamey Neteweyî Le Bizûtnewey Kurdistan Da, û Dêmukratîzekirdinî Dêmukrasî; Rexine Le Binemakanî Tiyorî Dêmukratî Le Goşenîgay Netewe Bêdewletekanewe hene. Sîrwan xwediyê du bawernameyên masterê di warê zanistên siyasî û xwendinên navneteweyî (lêkolînên cîhanî) de ye. Niha ew xwendekarê diktorayê zanstên siyasî ye li Zanîngeha Pennsylvania. Qadên lêkolînên wî yên hezkirî teoriya siyasî, neteweperestiya lîberal, teoriya demokratîk, serxwebûn (cudabûn), dadweriya axê û lêkolînên sînor in. Rênas organîzatorê xelata Jemal Nebez e.